# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (161):

## Gundên "Qenterê û Hucemala" yên dagîrkirî, vekirina gundekî hniştecîkirinê, revandin û girtin, pevçûn di nav milîseyan de û şewatên daristanan



















































Bi ser geregoşî û serberdayetiya serwerkirî ya li Herêma Efrînê ya dagîrkirî, û berdewamiya kiryarên qirêj û gendeliya giştî de, pilana guhertina demografî ya ku Turkiyê serpereştiya wê dike bi rêkûpêk dimeşe, û li vê dawiyê vekirina Gundê "Kiwêt Elrehme" yê niştecîkirinê yê nimûneyî hate ragîhandin, û kar di avakirina Gundê "Besme" yê li Başûrê Gundê "Şadêrê" - Şêrewa û hin din de berdewam e.

Ev jî hin binpêkirin û tewanên bûne ne:

**= G. "Qenterê":**

Bi Navça Mabeta ve girêdayî ye û /500/M ji navenda wê dûr e, ji /200/mal pêkhatî ye, û dora hezar nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, di dema dijayetiya Turkiyê de tev penaber bûn, tenê jê

/40malbat=200nişte/ vegerîn, û dora /150malbat=800nişte/ji anîndeyan -piranî ji Xota û Restenê- têde hatin niştecîkirin.

Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" ya ku biryargehên wê yên leşkerî li Bajaroka Mabeta hene gund desteser dikin, û Artêşa Turkiyê jî vêla hemwelatî "Hesen Hemo" ji xwe re kiribû biryargeheke leşkerî, lê ji demekê ve vala kir.

Bi topebaranê û di encama teqîna bombeyên zemînî de, şeş mal ên van hemwelatiyan "Şêxo Îbo Şaşo, Menan Arêf, Mihemed Hisên Heyder, Ehmed Hecîko, Mihemed Kêfo, Mihemed Osê" bi tevayî hatin roxandin, û malên "Eyûb Heyder, Mihemed Umer Elî" jî bi piçekî.

Milîseyan piraniya heyînên malan berî ku hin xelk vegerin dizîn, ji xwarinvexwarinê de bigir ta firaxên baqirî û qizêzî, alav, cerên gazê, amûrên taqeta"energiya" royê û tiştên din, û herweha beşek ji keblên toreyên elektirîkê û telîfona zemînî yên giştî, giropa zayenda elektirîkê (ampêr) a hemwelatî "Mihemed Umer Elî" dizîn, û makînên (teksiya Kiya Riyo ya "Elî Mihemed Mûrad", teksiya Sabe ya "Mistefa Yûsêf", teksiya "Nîzar Mihemed Yûsêf") - piştî ku li dema penaberiya dawiyê li Bajarê Efrînê li şûn xwe hîştin - hatin dizîn.

Û milîseyan dest danîne ser piraniya malmewalên koçberan, jê "Mihemed Hesen, Emîn Calo, zaroyên Îbiş, /3000/ darên zeytûnê yên dilovanber Emîd Menan Elî", û /10-15%/ vêrgî li ser berhema werzên hemwelatiyên mane ferz dikin, bi ser wê de jî dizîna berhema werzên zeytûna, tirî, simaqê û yên bilî wan, hîn zêdetir jî çêrandina bêwijdan ji aliyê şivanên palpiştkirî ji çekdaran ve, û herweha jî qutkirina hovane ji /60/ darên zêtûnê yên dilovanber "Menan Elî."

Û di encama bombebarana gund de, li 24.2.2018an "Ibrahîm Reşîd Reşo/5/sal" şehîd ket, û birayê wî "Hisên Reşîd Reşo/9/sal" û bav jî birîndar bûn, piştî ku malbat ji Gundê "Çolaqa" - N.Cindirêsê penaberî "Qenterê" bû.

Û ji xelkê gund ev şehîd bûn:

- "Nîzar Mihemed Yûsêf/39/sal", li 20.3.2018an, di encama teqîna bimbeyeke zemînî di maleke gund de.
- "Mihemed Yûsêf Yûsêf/69/sal", li 2.4.2018an, di encama teqîna bombeyeke zemînî de li ser riyeke gund.
- "Mes'ûd Menan Umer/35/sal", li 9.4.2018an, di encama teqîna bombeyeke zemînî de, li pêş mala cîranekî li gund.
-Herdu zarokên bira "Siyamend Şêx Ne'isan kurê Ehmed/8/sal, Hesen Şêx Ne'isan kurê Ehmed/11/sal", li 28.4.2018an, di encama teqîna bombeyeke zemînî li hewşa maleke koçberkirî li gund.
- "Arêf Hisên Cilo/62/sal", li 29.6.2018an, di encama teqîna bombeyeke zemînî de, li nêzîk malê li gund.

Û xelkê gund ên mane rastî cûrbecûr binpêkirinan hatin, jê revandin û girtinên bêsûcane di dermafê piraniyan de, vêre jî kêmrûmetkirin, işkencekirin û peresitandin - hin jê jî bêtirî carekê - û ta niha "Ronak Îbiş kurê Mihemed Fetah/28/sal" di Hepsa "Çobanbegê - Elra'î" de zorane veşartî ye, û ji 31.4 2018an ve, çarenûsa wî wendayî ye; Û li 28.8.2018an, giropeke çekdar e serçavgirtî êriş mala parêzer "Dawod Umer" - cîgirê serokê encûmena xwecihî li bajarokê Mabeta di wê demê de - kir, mekin li wî û hevjîna wî "Emîne" û xwîşka wî "Sultanê" xist, û bi ser de bo nexweşxaneyeke Efrînê ji bo dermankirinê hate guhestin.

Û gir û Zaretgeha "Berbe'ûş" ya Islamî û di navêna Bajaroka "Mabeta" û gundên "Qenterê û Ereba" de, ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên wan, rastî piroseyên kolandin, tevdan û tarûmarkirinê bi alavên giran hatin, ta ku gir bi erdê re dûz bû.

**= G."Hucemala":**

Bi Navça Reco ve girêdayî ye û ji Bakur ve /6/ KM ji navenda wê dûr e, ji dora /80/malî pêkhatî ye, dora /250/ nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, di dema êrişê de hemî penaber bûn, tenê jê dora /35malbat=90nişte/ vegerîn, ên din zorane hatin koçberkirin, û dora /100malbat= 600nişte/ ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin.

Di dema êrişkeriyê de, bi topebaranê mala hemwelatî "Heyder Qirmo" bi piçekî hate roxandin.

Û Milîseyên "Feyleq Elşam" gund desteser kirin, û heyînên hemî malan bi tevayî yan giştî, ji xwarinvexwarinê de ta firaxên baqirî û qizêzî, raxistek, cerên gazê, amûrên elektirîkê û amûrên taqeta elektirîkê yên royê û yên din dizîn, û herweha jî dizîna kebil û tiransa toreya elektirîkê ya giştî, du giropên zayenda Elektirîkê, û şeş tirektorên çandiniyê tevî acetên wan ên van hemwelatiyan "Mihemed Mecîd, Hesen Mecîd, Nûrî Mecîd, Isma'îl Bîlal, Arêf Hisên."...

Û dest danîn ser malên hemî hemwelatiyên ne li gund û guvêşgeha zeytûna ya "Isma'îl Bîlal" û acetên wê jî dizîn, bi ser de jî xwedî revandin, işkence kirin û avêtin rex malê wekî ku mirî be, vêca piştî ku hinekî çêbû,

neçar bû tevî malbata xwe bireve Herêma Kurdistanê, lê birayên wî "Elî û Mihemed" piştî çûndina wî du rojan hatin girtin.

Weha jî milîs/50%/vêrgî li ser berhema werzên hemwelatiyên ne li gund û /3%/ li ser yên li gund ferz dikin.

Û di encama topebarana Nexweşaxana "Avrîn" de, li 13.2.2018an, hin perçeyên avêjtekan li otombîlek teksî (ye kirê û li pêşiyê sekinî bû) ket, ajovanê wê "Ridwan Hisên kurê Mihemed - 1985" ji xelkê gund şehîd bû, weha jî hemwelatiyê sivîl "Ebdo Elî Hesen" di dema berevaniya di ber herêmê de wenda bû, û ta niha çarenûsa wî ne diyar e.

**= Vekirina gundekî niştecîkirinê yî nimûneyî:**

Li 30.8.2021an, G."Kiwêt Elrehme" yê niştecîkirinê ya nimûneyî, li nêzîk Gundê "Xalta" - Şêrewa li Çiyayê Lêlûn (yê li Rohilatê Bajarê Efrînê bi /10/KM dikeve) hate vekirin, da ku anîndeyan têde niştecîkirin bide û wan bi milkmewal bike, ji bo guhertina demogravî li herêmê bide cîbicîkirin; Divê were zanîn ku gund ji aliyê "Komeleya Şam Elxêr ve - Turkiyê" hate avakirin, ji /380/malên rûniştinê, mizgeft, dibistan, dermankirinxan, amojgeheke lezberkirina "Quranê" û bazareke bazirganiyê pêk tê, û destpêkirina pirojeyê ji aliyê "Encûmena Xwecihî li Efrînê" ve, li 17.3.2021an, hate ragîhandin; Lê ew Gundê "Xalta" yê biçûk jî, bi bombebarana asîmanî, ji aliyê Artêşa Turkiyê ve, li 31.1.2018an, bi piranî hate roxandin, û xelkê gund zorane hatin koçberkirin û qedexe kirin ku vegerinê.

**= Revandin û girtinên bêsûcane, û serbestberdana hin veşartiyên zorane:**

-Li 29.8.2021an, Milîseyên "Firqit Elsultan Melekşah" û serkêşê wê li Navça Şera yê bi "Ebû Şaman" tê nasîn hemwelatî "Mihemed Behrî Mihemed/43/sal" ji xelkê Gundê "Gobeleka" girtin, birin biryargeha xwe li avahiya guvêşgeha "Hemdoş" a zeytûna ya desteserkirî û li cateriya Gundê "Xirabê Şera", bi behaneya ku makînak pîkab a Partiya "Yekîtî ya Demkrat - PYD" li ba wî ye hate işkencekirin, li roja din dest danîn ser makînê, û ta niha di bin bendkirina zorane de ye.

-Li Şeva Duşemê 30.8.2021an, Milîseyên "Lîwa'i Elweqas" êriş birin ser malên "Azad Kemal Hesen/32/sal, Arêf Mihemed Şukrî/32/sal" li Gundê "Anqelê" - N.Şiyê, û herdu revandin û birin biryargeha xwe li Gundê "Merwaniyê" yê hevcîwar, û piştî işkencekirinê li roja din berdan, û tev jî da ku destlatî û zorkirina xwe li ser gund mekin bike, bi taybetî jî piştî gilîkirina xelkê ya pircare ji kiryarên wan li cem aliyine din.

Û destlatên dagîrkeriyê jî ev girtin:

-Li 24.8.2021an, hemwelatî "Fayêq Ebdo Mistefa Qere/35/sal" ji xelkê Gundê "Avrazê" - N.Mabeta, piştî vegera wî tevî malbatê ji Bajarê Heleb (ciyê penaberbûna wî), û birin navenda Efrînê, û di heman rojê de jî, birayê wî "Mihdîn" girtin, û piştî çend katan berdan.

-Li dawiya heyva borî, hemwelatî "Celal Ebdela Ibrahîm/38/sal" ji xelkê Gundê "Ebûdanê" - N.Bilbilê, ji aliyê "Asayişa Leşkerî" ve, piştî vegera wî tevî malbatê ji B. Heleb (ciyê penaberbûna wî) û dandina du hezar dolar ji milîseyên ku gund desteser dikin re bi behaneya serastkirina rewşa wî, û piştî pênc rojan ji girtinê ew berdan.

-Li 31.8.2021n, parêzer "Menan Ehmed Bêrem/42/sal" ji xelkê Gundê "Kêla" - N.Bilbilê, ji aliyê "Asayişa Leşkerî" ve li Bajaroka Reco, bi behaneya têkliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, û bo B.Efrînê hate guhestin.

-Li 30.8.2021an, hemwelatî "Luqman Reşîd Bekir/45/sal, Şakêr Hesen Ce'ifer/27/sal, Mihemed Zekeriye Mihemed (Çiro)/25/sal, Mihemed Menan Îbiş/45/sal" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna", ji aliyê "Asayişa Leşkerî" ve li Bajaroka Reco, li roja din piştî dandina baceyeke diravî yê taliyê hate berdan, û yên din jî hîn bendkirî ne.

Weha jî hemwelatî "Mihemed Reşîd Osman, Luqman Ebid Elrehman Heyder" ji heman bajarokê, ji aliyê "Dadgêrê Elniyabê li Reco" ve -bê ku werin bendkirin- her yek bi /1500/PT hate sezakirin.

Û herweha jî hin veşartiyên zorane serbest berdan:

- "Mistefa Ibrahîm Kêl Îbo" ji Bajaroka "Meydan Ekbezê" - N.Reco, li 31.8.2021an, piştî sê salan ji girtinê.
- "Mistefa Hebîb Seydo" ji Gundê "Gewenda - Meydana" - N.Reco, li 31.8.2021an, piştî sê sal û nîvan ji girtinê.
- "Mehmûd Oso" ji Gundê "Xelnêrê" - B.Efrînê, ji çend rojan ve, piştî dora sê salan ji girtinê.

**= Binpêkirinên virdewêde:**

- Ji destpêka 28.8.2021an ve, Milîseyên "Hêzên Taybet (Elquwat Elxase) - Feyleq Elşam" û serkêşê wê li Gundê "Birc Ebdalo" - Şêrewa "Ebdo Osman" yê ji Gundê "Kefer Heleb" - Gundewarê Heleb ê Rojava, li ser

her malbeteke Êzdî /100/dolar vêrgî ferz kirin, û divê bê zanîn ku halîhazir /50/malbatên Êzdî li kêlek ên Misilman -di nav de jî hin perîşan- li gund hene.

Û ta niha sê riyên ku derin nav baxçan û zeviyên çandiniyê yên li dor gund, ji aliyê wan milîseyan ve, ji 17.8.2021an ve, bi bendên axê girtî ne, da ku xelkê neçar bikin ku vêrgiyên diravî ji bo vekirinê bidin wan.

- Li 1.9.2021an, hejmarek ji anîndeyan mekin li temenmezinê Kurd "Mihemed Derwîş Miho (Tîtî)/70/sal" xistin, li dema ku wî pezê xwe li nav zeviyeke zeytûna ye wî de diçêrand û daxwaza vegerandina bireka xwe ya elektirîkê (ya ku wan anîndeyan li pêş çavan dizîne)kiriye, û di encamê de govde hate derizandin, birîneke mezin li serî hate vekirin û ser çavan jî reşemorî bû.

**= Geregoşî û serberdayetî, û topebarankirina B.Efrînê:**

- Li 20.8.2021an, pevçûnina di navêna Milîseyên "Firqit Elsultan Mûrad" û "Asayişa Leşkerî" de, li navenda Navça Bilbilê rûdan, û di encamê de, di nav herdu aliyan de birîndar cêbûn.

- Li şeşê Êvara Roja Duşemê 30.8.2021an, heyşt avêjtekên mûşekî ji aliyê herêmên di bin desteseriya Artêşa Sûriya û bandoriya Rûsî de hatin avêtin, û bi ser B.Efrînê û derdorê ketin, û di encamê de, şeş birîndar bûn û ziyanin şênberî gihîştin avahiyên niştecîbûnê.

- Li 1.9.2021an, di navêna bermayên Milîseyên "Lîwa'i Elxab" (ya ku "Mu'itez Elebdela" serkêşiya wê dike û ji aliyê Milîseyên "Firqit Elhemzat" ve hatiye qewtandin) û giropin din de, li gundên "Feqîra, Çolaqa, Gazê, Gundê Mezin, Maratê, Dargirê, Coqê", bi sedema tiştên dizînê û destdanîna li ser malan û malmewdanên xelkê, pevçûnina rûdan, û metirsî di nav xelkê de dan çêkirin.

- Li 3.9.2021an, giropine çekdar ji Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" gundên "Coqê û Dargirê" -piştî ku giropên "Elhemzat" ên li hev dixistin jê qewitandin- desteser kirin, da ku çarçewa bandoriya xwe li N.Mabeta (ya ku seferberiyeke leşkerî ji du rojan ve lê çêbûye) fere bike. Ev jî piştî nakokî û hevrikiyên berdewam di nav cûrbecûr Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî - Elceyş Elwetenî Elsûrî" de ya girêdayî Hemahengiya Sûrî - Ixwanî ya bi ser Turkiyê ve.

**= Şewatên daristanan:**

Li dawiya Demsala Havînê zincîra agirpêxistina daristanên Efrînê (yên ku ji destpêka talanê ve tûşî wêrankirinê dibin) hîn nesekiniye, û "Bergiriya Sivîl li Efrînê - Eldîfa'i Elmedenî" da xuyakirin, ku tîmên wê li 29.8.2021an şewatek li herêmên ihracê li Gundê "Qestelê" vemirandine, û herweha jî li 3.9.2021an hin şewatên daristanên gundên "Kefircenê - N Şera, Bajarika .Basûtê - Şêrewa, G.Xalta - N.Cindirêsê", û rûbera ya dawiyê dora /2/KM çarkoşe ye; Û piştî şewat bi dawî dibin jî, anînde, çekdar û serkêşên wan, ji bo êzingkirinê -bi behaneya ku hişk bûne- yên mayîn qut dikin.

Ta ku Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî - Elceyş Elwetenî Elsûrî" di kêmrûmetî, pêvegirî û nandoziyê de li ba Turkiyê dijîn, tiştekî normal û xwezayî ye ku li ser tiştên talanê û çarçewên bandoriyê li hev bixin, binpêkirin û tewanan berdewam bikin, û teror û metirsiyê di nav sivîlan de belav bikin.

05.09.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Sê malên roxandî li G ."Qenterê"- N.Mabeta.
- Pakrewan "Ibrahîm Reşîd Reşo, Nîzar Mihemed Yûsêf, Mihemed Yûsêf Yûsêf, Mes'ûd Menan Umer, Siyamed Şêx Ne'isan kurê Ehmed, Hesen Şêx Ne'isan kurê Ehmed, Arêf Hisên Cilo".
- Gir û Zaretgeha "Berbe'ûş" - berî û piştî kolandin û tevdanê.
- Veşartiya zorane "Ronak Îbiş kurê Mihemed Fetah" - G. "Qenterê" - N.Mabeta, 31.4.2021an Z.
- Pakrewan "Ridwan Hisên kurê Mihemed".
- G."Kiwêt Elrehme" yê niştecîkirinê yê nimûneyî.
- Bendeke axî li ser riyeke dere nav baxçan û zeviyên G."Birc Ebdalo"- Şêrewa.
- Temenmezinê govde bibirîn "Mihemed Derwîş Miho".
- Şewatek li daristana Qestelê - Efrîn, "Berevaniya sivîl - Eldîfa'i Elmedenî", 3.9.2021an Z, û têde qutkirina berê ji daran re tê xuyakirin.